Universität Bremen

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“

III.1.A. Têgeheke Navendî û Têgihiştinên wê yên li Qadê: Jin-Bûn

Charlotte Binder

Îlon 2017

blickwechsel
Studien zur zeitgenössischen Türkei
Ein Programm der Stiftung Mercator

III.1.A. Têgeheke Navendî û Têgihiştinên wê yên li Qadê: Jin-Bûn

Ji hêla rexneyên teorîsyênên queer femînîst, postkolonyal û poststrukturalîst yên bi zimanên îngîlîzî û fransizî di çarçoveyên zanistî de, herweha ji hêla nasnameyên cuda –yên ji Jin-Bûn'ê wêdetir – ku ji siyasetên nasnameyî yên tevgerên civakî yên nû ve hatin rave kirin, kategoriya zayend a homojen, gerdûnî bi taybetî ji destpêka 1990'an vir de hat felişandin an jî ji navendê hat derxistin (Kerner 2007). Ev yek bandoreke mezin li ser lêkolînên jin û zayenda civakî yên bi zimanê almanî jî, ku bi demê re nîqaşên di derbarê teorizekirina zayendê de guhertinên esasî çêkir, kir. Girêdayî nîqaşên „Sex/Gender“ de û „nîqaş û cudahî û newekheviyên di navbera jinan“, di navbera teoriya femînîst de pirsên wek: „ ‚Jin' çi ne? ‚Zayend' çi ne? ‚Em'ê rexneya femînîst ki ye?“ (Knapp 2008, S. 209) tên kirin.

Ev pirsyariya kategoriyan heta niha di nîqaşên femînîst ên Tirkiyê de jî tên çêkirin. Vê yekê wek mînak beşa hevpeyvîna li jêr, a di çarçoveya vê lêkolînê de bi Handan Çağlayan re hatiye kirin, dide der. Zanyara li Zanîngeha Enqerê hînker e û herweha di xebatên sendikayê de aktif e, pirsgirêka kategorîzekirinê bi vî awayî şîrove dike: „Li aliyekî, ger mirov xebatên bi vî şeklî bike, pêdivî bi kategoriyeke jin a giştî heye, lê ji hêla din de em wek zanyarên zanistên civakî dizanin ku kategoriyeke jin a giştî – wekî hemî giştîkirinan – xwedî pirsgirêk e.“(Çağlayan 2014: 22)[1]

Di çarçoveya gotinên mijarên rexnêyî û hevdibirin (intersectional) û herweha guhertinên binyatên civakî yên di lêkolînên jin û zayendî de kirdeya (subjekt) kolektif ‚em jin' û têgeha girêdayî wê *xwîşkîtî* ji bingehê hat pirsyar kirin (Lenz 2002, S. 78). Rexneya teorîk li nêrînên nasnamê û kirdeyê yên tevger(ên) jinan û femînîzmê, ku di destpêkê leqayî mudaxelaya rexneyî yên aktor*ên sîyasî hat, piştî teorîzekirina xwe bandora xwe li ser aktor*ên sîyasî yên jin û zayenda civakî kir û li wir pêvajoyên ciherengî û pirjimari yên tevgerên jinan û zayendan xurtir kir.

Bi vê paşbingehê ji bo vê xebatê ku tê de pêvajoyên ciherengî û pirjimari yên li Tirkiyê hatin lêkolîn kirin, ji 76 pispor*an wateya ‚jin bûn'ê *(kadın olmak)* pirsîn xwedî wateyekî navendî bû.

[1] „Bir taraftan bu tür çalışmaları yaparken genel bir [...] kadın kategorisine ihtiyacımız var ama bir taraftan da Sosyal Bilimciler olarak biliyoruz ki, genel bir kadın kategorisi bütün genellemeler gibi sıkıntılı“

Hevpeyvîner di hevpeyvînên xwe de pirsa wateya Jin-Bûnê pir cuda şîrove kirin. Li gorî gotinan bi awayekî aşkere girêdana wan a têgeha (teorîk) zayendî ne gengaz bû Hin hevpeyvîner ji pirsê şaşwazmayî xuya kirin û lewre jî daxwaza vekirina (fêmkirina) pirsê kirin (Wek mînak: Acar 2014: 15-16; Akkoç 2015: 39-41; Başak 2015: 16-21; Özkazanç 2014: 9-17; Ano-nym 2014: 8-18; Anonym 2015: 9-16; Anonym 2014: 9). Hevpeyvîner bi giranî li gorî têgihiştina xwe ya takekesî Jin-Bûnê formule kirin û her çiqas hatibe pirsîn jî di navbera perspektîfa takekesî û rêxistinî an jî akademîk de cudatî çênekirin.

Analîzên bersîvên wan têzên li jêr hatine rêz kirin derxistin holê. Ev têz ji bo têgihiştina Jin-Bûn‘ê, herweha têgehkirina kategoriya zayend ji perspektîfa sîyasî ya jin û zayendî li Tirkiyê baştir bê femkirin dê alîkar bin.

Pênaseya Jin-Bûn’ê girêdayî têgihiştina kirdewar (subjektîv) an jî nîqaşên (femînîst ên) derdorê tê meşandin.

Ji bo zanyar û weşangera kovara femînîst *Amargi*yê ya li Enqerê Aksu Bora Jin-Bûn dikare pir cuda bê fêmkirin û heta kesekê/î dikare gelek wateyan jê derxîne (Bora 2014: 14).Herweha Fêrkera Zanîngeha Enqerê Reyhan Atasü-Topcuoğlu di hevpeyvînê de balê dikişîne ser xala „kirdewar“ (öznel) a Jin-Bûn’ê, lê di heman demî de qala „kirdewariyeke parvekirî“ *(paylaşılan bir öznellik)* ku tim tê şêwandin (Atasü-Topçuoğlu 2014: 21) dike.

Ji Komeleya Piştgiriya bi Jinan li Bodrumê Figan Erozan vedibêje ku ew bi xwe girêdayî heza pênaseyê Jin-Bûn’ê û herweha bi giştî biryara mafa li ser bedena xwe digire dest: „Ez vê wekî ku ez dixwazim hebim pênase dikim, wek dixwazim bijîm, bifikirim, tevbigerim […] bedena xwe gorî dilê xwe bikar bînim.“ (Erozan 2015: 6)[2] Ji bo berdevka Kongreya Jinên Azad KJA Sara Aktaş ji Diyarbekirê û herweha ji bo Nurcan Vayiç Aksu ji Meclîsên Jinan ên Sosyalîst SKM ji Hopayê Jin-Bûn ne ji hêla jinan ve hatiye diyar kirin, Vayiç Aksu Jin-Bûn’ê wek nasnameyekê ku ji derve de, wek mînak ji hêla mêran ve, bavan ve an jî xwesû û xwezûr ve tê diyar kirin, şîrove dike (Vayiç Aksu 2015: 13). Ji ber vê yekê, li gorî Sara Aktaş, Jin-Bûn heta neha wek têgehekê ku felsefî an jî ontolojîk bê fêm kirin, nehatiye dest girtin. Têgeha *Jineoloji*yê ,Zanista

[2] „İstediğim gibi var olmak olarak tanımlıyorum, istediğim gibi yaşamak, düşünmek, davranmak […] bedenimi istediğim gibi kullanmak“

Jinê‘ – li gorî Aktaş – li ser vê esasê dê derfetê ji bo pênasekirina peyva Jin-Bûn’ê bi perspektîfeke siyasî ya jinê gengaz bike (Aktaş 2015: 9).

Profesora ji Zanîngeha Enqerê Alev Özkazanç balê dikişîne bandorên femînîzmên sosyalîst û queer li ser têgihiştina zayendê. Ji ber vê yekê bi alikariya perspektîfeke hevbirîn şîrove dike: „Jinan bi mirovên din re, bi mêran re jî, û herweha bi yên tên çewisandin re, bi hev re […] di têkiliyên aloz de*“ (kadınları başka insanlarla, erkeklerle de, ezilenlerle de birlikte […] karmaşık ilişkiler içerisinde*) analiz dike û baweriya wê bi „projeyên azadiyê yên bi hevre“ *(birlikte özgürleşme projeleri)* (Özkazanç 2014: 17) heye.

Di hevpeyvînên li herêma Egeyê hatin çêkirin de akademîsyenên wek Özlem Şahin Güngör ji bo têgihiştina Jin-Bûn’ê, wateya nîqaşên xwe yên bi teorî û pratîka femînîzmê re tînin ziman. Şahin Güngör di demên xwe yên xwendekariyê de hişmendiyeke femînîst girtiye. Ji ber vê yekê ew xwe di rewşeke aliyê erênî de Jin-Bûn’e dîtinê de dinirxîne. Jin-Bûn’ê bi taybetiyên aşkere, yên ji bo pêşketina civakê, ji hêla civakê ve bi awayekî erênî tên pejirandin, dinirxîne; wek mînak hêza „avakirinê“ (*yaratmak*), „tirûşdariyê“ *(dayanıklı olmak),* „fêmkirinê“ *(anlamak*) û herweha hêza „têkilî danînê“ *(ilişkiler kurmak)* (Şahin Güngör 2015: 16). Bi vê nêrînê Şahin Güngör ji dêl têgihîştineke queer-femînîst perspektîfeke teoriya-cudabûnê [3] ya li ser zayend dişopîne.

Ji xeynî têgehên kirdewar û femînîst ên Jin-Bûn’ê li her çar heremên lêkolînê perspektîfên oryantasyona zayendî ku „mirov bûn”ê esas digirin û li ser bîrdoziyê tên formule kirin, hatin rave kirin (wek mînak: Ay Katırıcı 2015: 14; Başak 2014: 19; Bostan 2015: 10; Uçar 2015: 10; Varan 2015: 17). Ji bo Nilüfer Akgün a ji Komeleya femînîst Piştgiriya bi Jinan a Deryaya Reş KARKADDER’ê jin „hemwelatî ye, kesayet e, di nava jiyana civakî de cîh digre, mirovê ku divê [bi yên din re]wekhev be“ pênase dike (Akgün 2015: 12).[4] Ji Navenda Jinan *Kardelenê* ya li Diyarbekirê Mukaddes Alataş dest nîşan dike ku him jin û him jî mêr di destpêkê de mirov in û bi vî awayî wekhevîtiya zayendan derdixîne pêş. Herweha Özge Zeynep Arıcı ji Hevalbendiya (piştgirîya) Jinan a ji Artvînê di esasê de jin û mêr wek mirov, wek „têşeya hebûnê“ *(bir var*

[3] Li gorî Kerner, teorîsyenên cudatiyê xwe dispêrin „taybetiyên jinan ên bi bîrxistinên erênî“ û bi vî awayî cudatiya zayendan „li ser esasa antropolojîk an jî nasnameyî ferz dikin.“ (Kerner 2007, S. 8)
[4] „Kadın yurttaştır, bireydir, sosyal hayatta var olandır, çalışandır, eşit olması gereken insandır.“

oluş biçimi) bi nav dike (Arıcı & Anonym 2015: 65).

Di diyarkirina Jin-Bûn'ê de cudatiya jinan tê destnîşan kirin.

Têgeha cudahiyê ji bo Räthzel „riya ji korerêya sîyasî û teorîk derketinê ye.“ Ev têgeh „konsepta ku hemî jinan wek komeke homojen dinirxîne“ ji hev belav dike û „peywîra cudatiya di navbera jinan dike navenda analîzê û stratejiyên azadiyê yên polîtîk wek peywîr derdixîne pêş.“ (Räthzel 2010, S. 287) Kerner nêrîna Elsa Barkley Brown, a derbarê nîqaşên di çarçoveya *nîjad, çîn* û *gender* de hatine bidest xistin bi vî awayî şîrove dike: „ Divê em bipejirînin, Jinbûn ji çarçoveya ku mirov tê de jin e, nikare bê îzole kirin û ev çarçove ji hêla ‚nijad', çîn, dem û cîh ve tê aşkere kirin. [Û ev jî dide xuya kirin ku] hemî jin ne xwediyê heman zayendî […] ne.“ (Kerner 2011, S. 133)

Di hevpeyvînên li Tirkiyê hatin kirin de Zanyar balê bi taybetî kişandin ser cudatiya navbera jinan. Wek mînak ji bo Aksu Bora „tenê jintiyeke“ *(bir tane kadınlık)* tune ye (Bora 2014: 14) û herweha Feride Acar di wê baweriyê de ye ku „her jin di heman rewşê de nayê dinê“ *(her kadın aynı konuma doğmuyor)* (Acar 2014: 16). Aktîvîst Hatice Kapusuz Kütküt ji Komeleya alikariyê ya ji bo namzetên jin KADERê ji Enqerê di heman baweriyê de ye: „Jin komên homojen nîn in. […] Kesên trans, lezbiyen, bi perwerde, bê perwerde, komeke gelek cuda û heterojen [e].“ (Kapusuz Kütküt 2014: 11)[5]

Dema Şahînde Yavuz ji Zanîngeha Teknîk a Karadenîzê wateya *çîn*ê (class) wek kategoriyeke cudatiyê dinirxîne, aktîvîsta LGBTI Seçin Tuncel ji rêxistina KAOS GL'ê girêdana Jin-Bûnê bi kategoriyên cudatiyê ve bi perspektîfeke hevbirîn (intersectional)[6] formule dike:

[5] „Kadınlar homojen bir grup değildir. […] translar, lezbiyenler, eğitimliler, eğitimsizler – çok farklı heterojen bir grup.“

[6] Analîzên hêzê yên hevbirînî (intersectional) bandora têşeyên cudakari û marjînal kirinê, ango rê û pêwendiyên kategoriyên cuda, wek mînak di têkiliyên civakî de pêwendiyên *gender*, *çîn* û *nijad*ê lêkolîn dikin (Winker und Degele 2007). Têgeha hevbirînî (intersectionality) di dawiya salên 1980'yan de ji hêla Kimberlé Williams Crenshaw ve wek gotarekê ji bo *United Nations Development Fond for Women hat pêşxistin (Crenshaw 1989, p. 149). Chrenshaw di vê textê de çeprasta trafîkê wek metafor bikar tîne: „riyên hêzê […] ku bi awayên cuda marjînalîze kirina komên xuya pênase dikin, di nav hevre derbas dibin, ser digirin û jê derbas dikin.“ (Räthzel 2010, p. 288–289)*

> […]Ez jineke lezbiyen im. Ji ber vê yekê […] pratîkên min ên rojane dikarin pir tiştî biguherin. […] Di heman demê de […] ez jineke lezbiyen [im] ku li bajarekî mezin dijîm, lewre jî pirsgirêkên jinekê ku li deştê dijî, dibe ku ji yên min gelekî cuda bin. (Tuncel 2014: 16) [7]

Di girseya vê hevpeyvînê de Tuncel li gorî sekna xwe ya di civakê de – wek jineke lezbiyen li bajarekî mezin – balê dikişîne ser tecrubeyên cihekariyê yên jinan û bi vî awayî nêrîna tecrubeyên hevkar ên jin*an red dike.

Ji bo salixdana pênaseyê konseptên teorîk ên cuda yên zayenda civakî tên destnîşan kirin.

Li gorî Lenz lêkolîna jin û zayenda civakî ji mijargirtina ‚jin'ê ber bi ‚zayend' ve, heta bi pirsyarkirina binyatên ‚Seks/Gender' (Lenz 2014, S. 16–17) pêş de ket. Piştî têgîhîştina „zayend wek çarenûsa kolektîf“ û têgeha wekhevî/cudatî di pêvajoya avakirina kategoriya zayend de hat „pirjimar kirin û vekirin, bi taybetî ji nirxên takekesî yên hişk hat veqetandin.“ (Lenz 2014, S. 23–24)

Di 65 hevpeyvînên pispor*an de konseptên (teorîk) ên cuda ku ji hêla Lenz ve hatin dest nîşan kirin û ji hêla hevpeyvîner*an ve hin caran vekirî, hin caran jî bi awayekî girtî û ne tim ji hev sînorkirî hatin zimên, dikarin ji bo qada lêkolînê ya li Tirkiyê jî bên bikaranîn.
Nêrîna li jêr a seroka Komeleya Parastina Mafên Jinan a li Denizliyê Nurten Karakış dikare ji perspektîfa puxteyî, biyolojî(st) û teoriya cudatiyê ya li ser zayend wek mînak bê dest nîşan kirin. Karakış di pêvajoya hevpeyvîna xwe de ji bo jinan û mêran daxwaza mafên wekhev, herweha tevlîbûna jinan a hemî qadên civakê dike, li jêr nêrîna xwe ya ‚jin' û ‚mêr'him bi dubendî û him jî bi sedemên bîyolojîk û olî tîne ziman:

> […] em daxwaza wekheviya biyolojîk nakin, em ji rewşa xwe memnûn in.[…]. Ger jin karibe bibe dayik, karibe dayiktî bike, ku Xwedayê mezin jê re tiştek ji

[7] „[…] ben eşcinsel bir kadınım. Dolayısıyla […] günlük yaşantımdaki pratikler de aslında birçok şeyi değiştirebiliyor. […] Aynı zamanda […] büyük şehirde yaşayan bir eşcinsel kadınım, dolayısıyla taşrada yaşayan bir eşcinsel kadının sorunları da benden çok çok daha farklılaşabiliyor.“

> mêran bilindtir daye, meziyeteke daye; hesta dayiktiyê […]. (Karakış 2015: 7)[8]

Di vê girseya tekstê de ku ji hêla Karakış ve Jin-Bûn û Dayik-Bûn wek têkiliyeke xwezayî derdikeve holê, ji hêla hin hevpeyvînerên bi siyaset û bîrdoziyên cuda jî hat bilêv kirin (wek mînak: Atasü-Topçuoğlu 2014: 21; Can 2015: 14; Çicek 2015: 8; Sancar 2014: 26; Anonym 2015: 43; Üst 2015: 6).

Aktîvîstekê ji Koalisyona Piştgiriya bi Jinan a li Denizliyê bilindkirina Dayik-Bûnê ji bo wateya Jin-Bûnê rexne dike û baweriya derbasdar a li Tirkiyê bi vî awayî dinirxîne: „[…] jinbûna te ne pêwîst e lê dayikbûna te pêwîst e. […] Ango jin xwe bi dayikbûnê dikare îspat bike.“ (Anonym 2015: 67)[9]

Ji bo İlknür Üstün a ji Koalîsyona Jinan a li Enqerê Jin-Bûn him taybetiyên bîyolojîk (sex) him jî civakî (gender) di nav xwe de dihewîne:

> Li hêlekê, [li hêla] bîyolojîk de tu binerî jin bi weslên xwe yên zayendî, bi memikên xwe hebûnekê ye, lê be guman jin bûn […] bi neçarî gelek tiştan tevlî cihê ku tu lê dijî, bi çandê, mirovan hilgirtin e. Him xweşikbûna wê jiyîn, lê zedetir bi zehmetiyên wê re tekoşîn [e]. (Üstün 2014: 20) [10]

Üstün Jin-Bûn'ê ji hêla biyolojîk de wek ji Mêr-Bûn'ê cudatî dinirxîne û destpêkê jinê bi riya weslên wê yên zayendî dinasîne.[11] Aktîvîst di heman demê de balê dikişîne ser çarçoveyên civakî ku him şansa Jin-Bûn'ê û him jî pirsgirêkên Jin-Bûn'ê bi awayekî spesifik diyar dikin.
Ji xeynî Üstün perspektîfeke binyatî ya civakî li ser zayendê ji hêla Aktîvîsta Femînîstên Vegan a ji Muğlayê Zeze ve jî tê danîn: „[…] wek gotina Beauvoir, ango ‚tu wek jin nayê dinê, tu dibî

[8] „[…] biyolojik eşitlik istemiyoruz ki, biz kendi halimizden çok memnunuz. […] anne oluyorsa kadın, bir annelik yapabiliyorsa ki ulu Tanrı ona erkeklerden üstün bir de şey vermiş, meziyet vermiş, annelik duygusu […].“
[9] „[…] kadın olman önemli değil ama anne olman önemli. […] Yani kadın rüştünü annelikle ispat edebiliyor.“
[10] „Bir yanıyla bakarsan biyolojik olarak, cinsel organlarıyla, memesiyle bir varlık ama tabi kadın olmak [...], yaşadığın yerle, kültürle, insanlarla birlikte pek çok şeyi taşımak zorunda olmak. Hem hoşluklarını yaşamak ama daha çok zorluklarıyla mücadele etmek.“
[11] Aktîvîsteke ji Koalîsyona Piştgiriya bi Jinê ya ji Denizliyê Jin-Bûn'ê wek „rind“ (*güzel*) rave dike û girêdayî vê wek nîşaneyeke taybet a Jin-Bûn'ê bi hebûna klîtorisê ya bi 8 000 şaneyan dinirxîne (Anonîm 2015: 67).

jin‘. Ev gotin ji bo min pir rast e.“ (Zeze 2015: 12)[12] Zeze di vê girseya hevpeyvînê de bi awayekî vekirî xwe dispêre têgeha Beauvoir, ku zayenda biyolojîk ji zayenda civakî cuda dike (Kerner 2007). Hin hevpeyvîner* balê dikişînin ser wateya pêvajoyên hînbûnê yên di nav jiyanê de, an jî wek mînak ên di nav malbatê de, ku di avakirina Jin-Bûn’ê de rol dilîzin (z.B. Çağlayan 2014: 22; Çicek 2015: 8). Herweha hat destnîşan kirin ku, ne tenê jin, mêr jî di nav rolên zayendî yên civakî de tên sosyalîze kirin (Acar 2014: 16; Anonym 2015: 67).
Herweha endama Kolektîfa Femînîst a ji Enqerê Pelin Kalkan Jin-Bûn’ê li ser şopa Simone de Beauvoir wek ji hêla civakê ve tê avakirin û tê hîn bûn, pênase dike:

> […] ango em hînê jin-bûnê dibin.Wek mînak, dibe ku ev hevokên min bin, mîsal ez pênebawer im, lewre […] ew rewşên jin-bûnê, mêr-bûnê ji min re pir spekulatîf xuya dikin û wek şexsî […] ger rewşa heyî weha nîn buya, minê balê nekişinda ser nasnameya xwe ya jinê, min sîyaseta jinê nedikir. Ango lewre [rewşa min a neha] ne li gorî sekna min e.Ne wek jin, ne jî wekî mêr, dixwazim him wekî jin û him jî wekî mêr xwe binasînim. Lê ez neha bi israr binê nasnameya xwe ya jinê xêz dikim, lewre em di rewşeke civakî ya gelek xerab de dijîn, û ez bawer dikim ku divê mirov ji bo vê yekê têbikoşe. (Kalkan 2014: 13)[13]

Kalkan ji ber sedemên guncav ên rewşa jinan li Tirkiyê xwe mecbûr hest dike û bi balkişandina ser nasnameya xwe ya jinê di nav xebatên siyasî yan jinan de cihê xwe digire. Lê di rastiya xwe de Kalkan wek aktîvîsteke LGBTI dubendiya kategoriyên ‚jin‘ û ‚mêr‘ bi têgîhîştina xwe ya queer a zayendî wek kesayet red dike.

Aktîvîstê LGBTI Halil Kandok ê ji Denizliyê kategoriyên ‚Jintî‘ û ‚Mêrtî‘ ji Kalkan wêdetir pirsyar dike. Kandok vîzyoneke rastiya civakî formule dike, ku tê de mirov mecbûrê nasnameyên zayendî nabe, heta kategoriyên zayendî ji holê tên rakirin:

[12] „[…] Beauvoir‘ın da sözü gibi yani ‚kadın doğulmaz, kadın olunur‘ bu çok doğru geliyor bana.“
[13] „[…] kadın olmayı aslında çok öğrendiğimiz bir şey yani. Bunlar benim cümlelerim olabilir mi emin değilim mesela, çünkü […] tüm o kadın erkek olma filan halleri çok kurgusal geliyor bana ve kişisel olarak […] mevcut durum böyle olmasa ben kadın kimliğimi vurgulamam, kadın politikası yapmam. Yani çünkü benim aslında duruşuma çok uygun değil, ne kadınla erkek, hem kadın, hem erkek olarak tariflemeyi seviyorum kendimi. Ama hani ısrarla kadın kimliğinin altını çizerim çünkü berbat bir toplumsal halde yaşıyoruz, tabi bunun mücadelesini vermek gerektiğine inanıyorum.“

> Ger bandora zayenda civakî û heteroseksuelî tune bana, dibû bu ku min xwe aîdî tu zayendî nedîta, wê di lîteratura min de ne tiştekî wek jintî ne jî mêrtî hebana. Ango divê mirov destpêke pirsyar bike, mêrtî û jintî çi ne […] lê dibe ku ez him mêr im, him jî jin im. Lê ji ber pêwîstkirina zayenda civakî dibe ku ez dixwazim xwe bê zayend binasînim. (Kandok 2015: 22)[14]

Him Kalkan, him jî Kandok di hevpeyvînên xwe de daxwaza vezelokitiyê girêdayî kategorîzekirina zayendan dikin û di axaftinên xwe de „zayendîya bi zorî“ rexne dikin. Dema ku cudatiya Sex/Gender „ji biyolojiyê derxistina Gendere“ derxist holê, teoriya Butler jî ji sala 1990'an vir de ji biyolojiyê an jî ji xwezayê derxistina zayendiyê (sex) bi xwe re anî (Kerner 2007, S. 11–12). Di hevpeyvînan de perspektîfa queer an jî binyatî li ser zayendê di çarçoveya Judîth Butler de tenê ji hêla aktîvîstên LGBTI ve, ku di civaka serdest a Tirkiyê de wek mêr tên pênase kirin, hatin formule kirin. Wek mînak ji Komeleya LGBTI Hebûn a ji Diyarbekirê Arîf civakê û tevgera jinê ji ber konsepta civakî ya salixdayî û hişk, ku nahêlin kesayet li gorî dilê xwe zayenda xwe hilbijêre, rexne dike:

> Ango ger em neha li gorî civakê biçin, jin bûn tê wateya vajinayê, ger vajîna te hebe tu jin î, ger penîsa te hebe tu mêr î .[…] Ez dikarim vê yekê ji bo gelek tevgerên jinan jî bibêjim, lê ji bo Hebûn pênaseya jin û mêr tune ye.[…] Ango ger ez bêjim ez jin im, hevalên min ên jin min dipejirînin. Dirûvê min, penîsa min, an jî […] weslê min bê wate ne. (Arif et al. 2015: 19)[15]

Jin di heman demê de him wek biresera (objekt) pasîf, him jî kirdeya (subjekt) aktîv tê pênase kirin û ji bo tevgeriya sîyasî ya hevpar daxwaza pêşxistina „hişmendiya jinê“ tê kirin

Li gorî daneyên azmûnî, têgihiştina Jin-Bûn'ê ya heremî û sîyasî-bîrdozî, di heman demê de diyarkirina jinê wek biresera pasîf û herweha kirdeya aktîf, ku li ser tecrubeyên (bi zanebûn)

[14] „[…] toplumsal cinsiyet ve heteroseksizmin etkisi olmasaydı belki de ben kendimi cinsiyet olarak hiçbir şey hissetmeyecektim, benim literatürümde erkeklik veya kadınlık diye bir şey olmayacaktı. Yani erkeklik ve kadınlık nedir, önce onu sorgulamak gerekiyor. […] Ama belki de hem erkeğim hem kadınım ama bu toplumsal cinsiyet dayatması yüzünden de ben belki de cinsiyetsizim diye tanımlamak istiyorum kendimi.“

[15] „Yani şu an topluma göre gidersek, kadın olmak demek vajina, vajinan varsa kadınsındır, penisin varsa erkeksindir. […] birçok kadın hareketi için de bunu çok rahat söyleyebilirim ama Hebûn için kadın ve erkek tanımı yok […]. Ben kadınım desem, kadın olarak arkadaşlarım beni kabul ediyor yani görüntüm, penisim ya da […] organlarım önemsizdir.“ Herweha gotinên Varatyan di vê derbarê de hene: Varatyan 2015: 27.

tepisandinê bertek nîşan dide, dikarin bên nirxandin. Bi vî awayî di navbera tepisandin û berxwedanê de têkiliyekê wek avaker ji bo wateya Jin-Bûn'ê tê pênase kirin (Ay Katırcı 2015: 16; Bora 2014: 14; Gürdal 2015: 19; Kapusuz Kütküt 2014: 11; Semiz 2014: 16). Wek mînak ji Akademiya Jinan a Diyarbekirê Figen Aras jinê ne tenê wek mexdûr dibine, berevajê vê dadixuyîne ku:

> […]Em ji hêlekê ve behsa heyîneke ku jiyanê didomîne, di têkiliyên civakî de roleke mezin digire , lê ji hêla din ve [heyîneke ku] tê bindest kirin û mêtînger kirin, ango[heyîneke ku] bi giştî him kirde, him bireser e, dikin. Ango ne tenê li ser esasa mexdûriyetê. (Aras 2015: 6)[16]

Wêneya jina tê tepisandin, ku divê ji bo guhartina vê rewşa civakî, bi awayekî çalak li hember tepisandina ji aliyê mêran ve tê, serî hilde, wek mînak ji hêla Nefise Yenigül a ji Partiya Azadî û Piştgiriyê ÖDP ya Hopayê tê teswîr kirin: „Ji bo min Jin-Bûn tê wateya serhildêr bûnê, li dijî binyata desthilatdar a zilam çîk sekinandin e, ji bo azadiyê tekoşîn meşandin e,[…] ji hêlekê ve tengasiya van tên jiyîn, lê ji hêla din ve divê mirov tekoşe.“ (Yenigül 2015: 7)[17]

Hilbijartina pêyvan a di hevpeyvînan de îmaja xweyî yên pispor*ên sîyasî yên jin û zayenda civakî wek aktîvîst* dide der. Jin-Bûn wek mînak bi lêkerên wek „tekoşîn kirin“ (*mücadele etmek*), „şer kirin“ (*savaşmak*), „berxwedan“ (*direnmek*), „guhertin“ (*dönüştürmek*) an jî „hewl dan“ (*çaba sarf etmek*) herweha bi rengdêrên wek. „bihêz“ (*güçlü*), „çalakvan“ (*aktivist*), „tekoşer“ (*mücadeleci*) an jî „ya diguherine“ (*değiştiren*) tê rave dikin. Ji Jinên Mala Gel a li Enqerê Sevinç Hocaoğulları têgihiştina xwe ya Jin-Bûn'ê wek Yenigül pênase dike: „[…] Jin-Bûn […]tê wateya […] şer kirinê […]. […] Jin-Bûn tê wateya tekoşîn kirinê, ez difikirim, Jin-Bûn tekoşînê mezinkirin e.“ (Hocaoğulları 2014: 12)[18] Di hevpeyvînên din de nêrîna xala dezavantaj a Jin-Bûn'ê derdikeve pêş (Eren 2015: 8; Gedik 2015: 7; Yavuz 2015: 9).[19]

---

[16] „[…] hem bir yanıyla yaşamı sürdüren, toplumsal ilişkilerde çok büyük payı olan, ama bir yanıyla da ezilen ve sömürülen, yani hem özne hem nesne toplamı gibi bir varlıktan bahsediyoruz. […] Yani mağduriyet üzerinden değil sadece.“

[17] „Benim için kadın olmak, asi olmak demek, erkek egemen yapıya karşı dik durmak demek, özgürlük için mücadele etmek demek. […] bunların sıkıntılarını yaşarken, aynı zamanda mücadele etmeyi gerektiriyor.“

[18] „[…] kadın olmak […] mücadele demek […]. […] kadın olmak demek direnmek demek, kadın olmak demek mücadeleyi büyütmek demek diye düşünüyorum.“

[19] Zanyarekê gotineke wek Aras û Yenigül bi kar tîne, lê piştî nîqaşa xwe ya bi teoriya femînîst re stratejiya Jin-

Him zanyar (wek mînak: Acar 2014: 16; Şahin Güngör 2015: 14) û him jî aktîvîst (wek mînak: Akkoç 2015: 41; Başak 2014: 1; Anonîm 2014: 9) balê dikişînin ser hişmendiya dijî tepisandina jinan, ku ji bo avakirina Jin-Bûn'ê û herweha ji bo damezirandina aktîvîzma sîyasî ya jin û zayendî roleke navendî dilîze. Ji bo ravekirina pêvajoya hişmendiyê hevpeyvîner* lêkerên wek „pirsyar kirin“ *(sorgulamak),* „têgihîştin“ *(fark etmek*) sowie „pê derxistin*“ (farkına varmak)* (wek mînak: Cağlayan 2014: 22; Cön 2015: 10) bi kar tînin. Ev yek li cem Reyhan Atasü-Topçuoğlu di formulasyona „hişmendiya jintiyê“ (*kadınlık bilinci*) de ku gelek pewîst dibîne, xwe kom dike: „[…] ji ber ku hemî tepisandin girêdayî hevdû ne û beyî yek nebe yên din jî nabin û enerjiya berdewam kirina jiyanê û tekoşînê vê hişmendiyê dide.“ (Atasü-Topçuoğlu 2014: 21)[20] Bi heman awayî ji Navenda Jinan KAMERê ya li Muğlayê Gaye Cön dibêje, ji bo pirsgirêkên jinan divê hişmendî [-ya femînîst] bê pêşxistin ku jin karibin bi hev re tevbigerin (Cön 2015: 10).

Encam

Analîza daneyên azmûnî têgihîştinên pispor*ên sîyasî yên jin û zayendî yên curbecur ên derbarê Jin-Bûn'ê herweha têgeha kategorîya zayenda civakî dide der.

Hin hevpeyvîner* pênaseyê girêdayî nasandinên bîyolojîk û xwedayî, herweha pêkutiyên civakî dinirxînin. Yên ku pênaseya Jin-Bûn'ê pirsyar nakin, heta wek bîyolojîk û/an jî xwezayî dipejirînin, Jin-Bûn'ê bi awayekî puxteyî bilind dikin. Di navbera hevpeyvîner*ên ku bi rexnegirî nêzikî avakirina zayenda civakî dibin de hin kesên ku bicîhkirina zayendî ya duserî (jin-mêr) dipejirînin jî hene û him jî yên kategoriyên zayendî bi awayekî tundî red dikin jî hene. Girêdayî nirxandinên avakirina Jin-Bûn'ê an jî zayendê di navbera qadên lêkolînê de cudatî nehat tespît kirin. Herweha Pelîn Şirin – ji Partiya Gelan a Demokratîk HDP a ji Trabzonê – di hevpêyvînê de destnîşan dike: „[…] Jin-Bûn wekî li her derê cihanê li Tirkiyê, […] û li herema Trabzonê jî gelek zor e.“ (Şirin 2015: 15)[21]

Bûn'ê li ser esasa „wesfa mexdurî“ (*kurban vasfı*) ya jinê pênasekirinê rexne dike (Anonym 2015: 16).

[20] *„[…] çünkü o tek tek ezilmelerin aslında ne kadar birbiriyle bağlantılı ve biri olmadan diğeri olamayacak bir şey olduğunu görmeyi ve […] hayata devam edecek tekrar savaşacak enerji bulmayı o bilinç sağlıyor […].“*

[21] „[…] kadın olmak Türkiye, dünyanın her yerinde zor olduğu gibi yani Trabzon yerelinde de çok zor […].“ Hin hevpeyvîner balê dikişînin ser rewşa tecrûbeyên cuda yên jinan (wek mînak: Ersöz û yên din. 2015: 42; Tuncel

Ji ber cudahiyên di navbera jinan de, ku ji tecrubeyên cuda derdikevin holê, ji bo Handan Çağlayan, wekî ku di destpêkê jî hat rave kirin, di derbarê Jin-Bûn'ê de axaftin an jî jinan di pêvajoyeke an jî rewşeke dîrokî de komkirin pirsgirêk e (Çağlayan 2014: 22). Ji ber vê yekê Çağlayan bi taybetî guherbarî û bihurbariya kategoriya nasnameya-jinê binxêz dike: „[…] Jin-Bûn ji nasnameyeke neguherbar, tek, razber […] yekpare zêdetir nasnameyeke ku di nav tekoşîna civakî de têşeya xwe digire, diguhere, û bihurbar e.“ (Cağlayan 2014: 24))[22] Ji ber xebata xwe ya akademîk û aktîvîst Jin-Bûn'ê wek kategoriyeke puxteyî an jî xwezayî nagre dest, ligel vê di nasnameya jintiyê de, ku ji hêla aktîvîzma sîyasî ya jin û zayenda civakî ve jî tê fêrkirin, bandora civakê destnîşan dike.

Lêkolînera jin û zayenda civakî Özlem Şahin Güngör di hevpeyvîna xwe de Jin-Bûn'ê wek „têgeheke sîyasî“ (*politik bir kavram*), ku divê ji hêla zanebûna akademîk vê bê hilberîn û berfireh kirin, pênase dike. Li gorî Sara Aktaş „zanista jinê“ *Jineolojî* potansiyela pênasekirina vê têgehê bi awayekî teorîk û perspektîfeke sîyasî ya jinê dihewîne.

Ji dêl nîqaşeke li ser kategoriya zayendê bi awayekî rêzbar û teorîk, hin pispor* di hevpeyvînan de qala „serpêhatiyên jinê“ (*kadın deneyimleri)* yên xwe yên şexsî – wek xala destpêkê û motîvasyona tevlîbûna sîyaseta jinê – kirin (wek mînak: Akgün 2015: 12; Atasü-Topçuoğlu 2014: 21; Aydın 2015: 11; Karakuş 2015: 19; Yavuz 2015: 9). Bi alîkariya vê stratejiyê beyî ku kategoriya zayend an jî kirdeya ‚em jin‘ bi awayekî vekirî bê pênase kirin, esasa tevgereke polîtîk a hevpar gengaz dibe. Lê girêdayî vê ji ber şert û mercên civakî û binyatî tecrubeyên jinan ên homojen ji nû ve tên ava kirin.

Çavkanî

- Crenshaw, Kimberlé (1989): Demarginalization the Intersection of Race and Sex. A Black Feminist Critique of Antidiscrimination Doctrine, Feminist Theory and Antiracist Politics. Di nav: The University of Chicago Legal Forum (Ed.): Feminism in the law. Theory, Practice and Criticism. Chicago: Chicago University, p. 139–167.

2014: 16).

[22] „[…] kadın olmak, değişmez, mutlak, soyut, […] yekpare bir kimlik olmaktan ziyade, toplumsal mücadele içerisinde şekillenen dönüşen, geçirgenlikleri olan bir kimlik.“

- Kerner, Ina (2007): Konstruktion und Dekonstruktion von Geschlecht. Perspektiven für einen neuen Feminismus. Navnîşana Online: http://www.fu-berlin.de/sites/gpo/pol_theorie/Zeitgenoessische_ansaetze/KernerKonstruktion_und_Dekonstruktion/index.html, niherîna dawî 29.08.2014.
- Kerner, Ina (2011): Geschlecht. Di nav: Gerhard Göhler, Matthias Iser und Ina Kerner (Ed.): Politische Theorie. 25 umkämpfte Begriffe zur Einführung. Wiesbaden: VS, p. 126–141.
- Knapp, Gudrun-Axeli (2008): Give Sex, Gender and Sexuality more of a Society. Zur Standortbestimmung feministischer Theorie. In: *Feministische Studien - Zeitschrift für interdisziplinäre Frauen- und Geschlechterforschung* 26 (2), p. 208–219.
- Lenz, Ilse (2002): Wie verändern sich die Neuen Frauenbewegungen? Ein Ansatz zur Transformation sozialer Bewegungen. Di nav: *Zeitschrift für Frauenforschung & Geschlechterstudien* 20 (4), p. 65–82.
- Lenz, Ilse (2014): Geschlechter in Bewegung? Di nav: Barbara Rendtorff, Birgit Riegraf und Claudia Mahs (Ed.): 40 Jahre Feministische Debatten. Resümee und Ausblick. Weinheim: Beltz Juventa, p. 12–30.
- Räthzel, Nora (2010): Rassismustheorien. Geschlechterverhältnisse und Feminismus. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, p. 283–291.
- Winker, Gabriele; Degele, Nina (2007): Intersektionalität als Mehrebenenanalyse. Navnîşana Online: https://www.tuhh.de/agentec/winker/pdf/Intersektionalitaet_Mehrebenen.pdf, nihêrîna dawî 18.02.2014.